

**Tewana Kuştinê**  
**Kiryara hovane...**

**Dr : Rozad Elî**

**Di** sala 2008an de bêtirî sî mirovî, jin û mêr, li Navça Efrînê hatine kuştin. Ev jî rûdaweke civakî , mirovane û li navçê pir awarte û nû ye. Şêniyê wê şêtmêt dike û tirseke mezin peyda dike. Ji bilî ku ew dihêle ji hêla her welatîyekî ve li naça.Efrînê û li derbarî bingeş û sedemên pîrbûna wan bûyerên hovane, pîrsên xemgîn û bi êş were pîrsîn.

Erê kuştina mirovan ji berê û ji dema (Adem Ê Hewê) ve hebû û dibû û li her navçekê û welatekî tê dîtin. Lê, ew hejmara kuştîyan li gor serhejmara şêniyê navça Efrînê hejmareke mezin û pir bilind e û rûdaweke pir bi tirs û xerap jî datîne ber çavan.

Li gor sedemên yekser û naskirî ji wan bûyeran re, ew parve du cureyan dibin:

**Yek:** Kuştina jinan û keçan. Ew bi behaneyê pîrsên (namûsê û pakirina şerefê!) tên kirin. Lê, li gor zanînan, pîraniya vê kuştinê li ser gumanê hatine kirin û tu nîşanên ne durist li ser endamên govdên ew jinên kuştî nehatine dîtin.

Di vî warî de, gelek tişt hene, rê li ber kuştinê û kuştarên jinan dûz dikin û pêkanîna ew kiryara çepel hêsan û nîv rewa jî dikin. Wek: gedên civakî yê kevneperest û zagonên dewletê yê kevin û nerm di tenga dadkirina kuştarên jinan re. Ev tişt sezaya kuştarên jinan pir hindik dikin û pîraniya çaran, piştî çend mehan kuştar serbest tên berdan û bi (serbilindî) li civakê vedigerin.

Hejmara vê cureyê ji kuştinê, dora çaryek ji tevahiya tewana kuştinê.

Yên ku îsal li navça.Efrînê bûne ne.

**Didu:** Kuştina ji ber sedemên civakî, aborî, tolvedanî, serserîti û tiştine din dibin. Tiştê herî balkêş û diyar di van kiryarên kuştinê de, pîraniya kuştaran di rewşên serxosiyê de tên dîtin. Ew meyê vedixin yan jî narkotîkê dibin,û dibin hikariya wan de pêkanîna tewanên kuştinê yê çepel û gelek tiştên pîs dikin.

Kuştinên vê cureyê bi tevahî ji ber sedemên biçûk dibin. Loma jî, çareserkirina wan pîrsgirêkan pir gengaz û hêsan e û gelek çaran dîlferehiyek û lêborînek kanin xwînretinê rawestînin.

Di vî warî de, gelek welatî pêçiyar dirêj dezgehên asayişên dewletê li navça Efrînê dikin, û wan di warê zirtkirina gelek xortan de gunehkar dikin.

Dîsa di vî warî de, rola kesên xêrxwaz, gernas û partiyên siyasî xuyan dibe û stubariyên wan ên zor pêwîst dest pê dikin.

Li sala borî 2008 an, cureyêke din û nuh ji Kuştinê li nav Kurdên navça Efrînê hat dîtin. Li gor çavkaniyên asayişên dewletê û sîxurên wan, û li gor zanînan ku alîgirên Partiya Karkirên Kurdistanê PKK jî yê ku ji devê xwe berdidin, ew kuştin ji ber sedemên siyasî hatine kirin. Sedema wan kuştinan ya rastî ne diyar e, lê hejmara wê li navça Efrînê gihîştîye çaran. Yek jê li bajarê Helebê û sisê jî li navaça Efrînê hatine kuştin. Yek ji wan kuştîyan zarokêkî sê salî bû û di hembêza bavê xwe de hat kuştin. Dîsa li gor gotinên alîgirên PKK, **D.R.(11)**